

dabaş

## PÊWISTÎ

Bê goman endametî, binbarî ye... Baweriya mirov di alîkarî û piştgiriya sazî û komelan de, yan jî di civakên bilind de xwe di rêya endametiye de nîşan daye. Rast e, di nava Kurdan de, sazî û komele nû ne... Civaka me jî, di vê hêlê de nezan e... Demsalên xedar û kedxwerî civaka Kurdî tertûbela kiriye. Ne hiştiye xwe li dora nîrxên xwe bihûne... Ne hiştiye li xwe xwedî derbikeve... Bela kiriye, şepirze hiştiye... Çav tirsandî û dilwêran kiriye... Hêvî û daxwazên wî wînda kirine... Ev teva bû ne sedema nezanîne, bû ne sedema li xwe, li nîrxên xwe xwedî derneketinê. Civaka ku li xwe û li nîrxên xwe xwedî dernekeve, nikare xwe xwedî mal, xwedî erd, xwedî welat bihesibîne... Civaka belawela, bê sazî û bê rêxistin mehkûmê windabûnê ye. Ji ber vê çendê, di nava Kurdan de, **berxwedan jiyan e** bûye stûna hebûn û mana ser lingan... Ne li welat, li welatên biyanî ku em bi pênerberî dijîn, ji bo pêşerojan pêwistiyeke derketiye hemberî me û me destên xwe avêtiye hevûdin. Hêvî û daxwazên xwe kirine yek. Bo bersivdana pêşerojan, me bar daniye ser milên xwe. Çi sazî be, çi rêxistin be, her mirovê dibe endam, berî her tiştî destûra wê erê dike û dibe endamê wê. Endametî jî, hinek berpirsiyariyan tîne. Ji ber ku binbarî, mirov dike xwedî gotin û gavavêtin jî. Ne bes di dengdanê de ev kar pêk te. Di pêşerojan de, xwedîtîya qarûbar û tevlîbûna xebatê bi xwe re tîne. Yanî her endam, çi di rêxistin de be, çi di saziyan de be, xwedî mafê çavdarî û pîrsa kar e û pêwistê xebat û beşdariya qarûbar e... Berî her tiştî û bêhtir ji her kesî em Kurd pêwistî xwedî derketina rêxistin û saziyên xwe ne. Ji ber ku em Kurd tenê mane di bin tûnê xelkê de. Em Kurd bi tenê ne xwedî maf in... Em Kurd tenê ne xwedî cih û war û welat in... Ji ber vê çendê, me, beşê yekem, di nava Enstituya Kurdî ya Brukselê de, hewl daye ku her meh rojnameyek 4 rûpelî, bi çalekî û nûçeyên saziyê û hin têgihîştin derbixînin û bigihînin destên we. Rojnameya me ji nivîsandinên her kesî re vekiriye. Lê, hêviya me ew e ku nivîsandin ji yek rûpelî ne bêhtir be. Dabaş jî li ser huner û çanda Kurdî be... Ev dabaş, ne li cem me Kurdan bi tenê, li cem xelkê cihanê teva stûna avaniya civakî ye. Pêwist e ku sexlem û bi hêz bibe... Komên ku çand û hunera wan sexlem û bi hêz be, li kîjan qeraxê Topîzemîn bin jî, di jiyanê de xwedî gotin û qerar in.

Medeni FERHO

## KONGREYA ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ ÇÊBÛ

Kongreya Enstituya Kurdî ya Brukselê, ya sala 1996 an li salona Enstituyê roja Şemiyê, 13 ê Çile, bi beşdariya pîrrianiya endaman çêbû... Li gorî nîzamnemeya hundirû, karûbarê salên pêşerojan di nava beşan de hatibû pejirandin.

### REWŞENBÎR HÊDÎ HÊDÎ REKIHE DIŞIKÎNIN

Di van rojên dawî de guftûgoyek di derheqa 'rewşenbîr çi ye, jî kê re tê gotin û rewşenbîrên Kurd di kîjan qonaxê de ne?' tê kirin. Pêşî, Firat Cewerî, di programekê jî ya telewîzyona MED de, neşter li birînê da. Piştê, çiqasî bi axaftina Cewerî ve ne girêdayî be jî, Şerefxan Cizîrî di nivîsandineke xwe de, ku di **Özgür Politika** de hate weşandin dest pê kir. Gunay Aslan, bi nivîsandineke dirêj bersiva Cizîrî da û mînak li ser Şivan Perwer anî ziman. Selîm Ferat, di aynî rojname de bi nivîsandinekê tîr mînak tevlî guftûgoyê bû. Guftûgo berdewam dike. Bi rastî, dil dixwest ku ev dabaş bi zimanê Kurdî bête kirin û bibe dewlemendiyeke jî çanda Kurdî re. Car din, bextiyariyeke ku neşter li vê birîna merezoyî bikeve û rewşenbîrî jî, bi wê balkêşiya xwe di nava civaka Kurdî de bersiva xwe bibîne. Lê hêvî ew e ku dabaş ne bes di *Berdewam rû. 2*

### NÛÇEYA SEMÎNERA MEHDÎ ZANA, DI RÛPEL 2 DE YE

Bi armanca karûbarekî bi rêkûpêk û akademîk, beş, ji 4 koman hatibûn sazî kirin. Ev beş: 1/ Ziman û Edebiyat, 2/ Mafê Mirovan û Agahdarî, 3/ Huner û Muzîk, 4/ Xebata Civakî û Çandî, Her çar beş wê di nava xwe de kesan bibijêrin, di heyeta îdarî de beşdar bibin û berpirsiyariya karûbarê beşa xwe bikin, mesûliyeta xebatê jî bigirin ser milên xwe. Kongrê, biryara endamên Heyeta Îdarî ku ji 11 kesan pêk tê, li gorî kêma û zêdebûna endaman di beşan de û bijartinê stend. Li gorî biryarê, **beşa yekemîn** 3 kes, **beşa duyemîn** 4 kes, **beşa sêyemîn** 2 kes, **beşa çaremîn** 2 kes... Piştî civîna beşan û hilbijartina di navbera beşan de 11 kesên Heveta Îdarî derketin meydanê. Eynî rojê, Heyeta Îdarî civîna xwe çêkir û li gorî destûra Enstituyê serok, sekreter, malxwêti û 2 kes jî cîgirê serok bijartin. Heyeta Îdarî ji van kesan pêk hat: Derwêş M. Ferho, Baran, Pervîn Cemîl, Şaho Saleh, Mihdî, Mustafa Aldur, Kerîm Baqîstanî, Medeni Ferho, Feqîr Ehmed, Şêrgo (Beşîr) Komar û Xosrow Abdullahî... Heyeta Îdarî jî, di nava xwe de: **Derwêş M. Ferho** serok, **Kerîm Baqîstanî** sekreter, **Mihdî** malxwêti (muhasib), **Baran, û Şaho Saleh** cîgirê serok, hilbijartin.

## ABDULLAH VARLI LÎ SER WERGERA QURANÊ SEMÎNER DA

Nivîskar Abdullah Varli, 3 yê Sibata, roja Şemiyê li Enstituyê li ser wergera Quranê bi zimanê Kurdî axivî. Bi beşdariya pîrrianiya kesa, saet 14.00 semînerê, bi nasandina nivîskar û pêwistiya nasandina rewşenbîr, nivîskar, qedirşinasên Kurd di nava civata Kurdan de, ji teref **Derwêş M. Ferho**, dest pê kir. Birêz Abdullah Varli, bi pêwistiya pirtûkên olî û wergera wan bi zimanên gelan dest bi axaftina xwe kir û wiha got: 'Li gorî baweriya olî, (çi ol be bila bibe) pirtûkên pîroz dive ku bi zimanê wî gelî bêne xwendin. Ku bi zimanê wî gelî neyêne xwendin nîrxê nabîne.' Birêz Varli, piştê gotin anî ser astengên ku di dema destpêka wergerê de derketin pêşberî wî... Di hêla ferhenga Kurdî de, di hêla gramer û devokên curbecur de çawa rawestiya ye, çawa mijûl bûye, bo serkevtinê

Berdewam rû. 3

## ZANA: 'SER EM ŞIYAR KIRINE'

Piştî qerara semîner û konferansan li Enstituyê û derveyî Enstituyê, êvara Pêncşemê, 8 ê Sibatê, li salona Enstituyê ji teref **Mehdî ZANA** li ser rewşa Kurdistanê û politîka dewleta Tirk axaftinek çêbû. Bi beşdariya pîrr kesan, civînê saet li 19 an dest pê kir. Weke her car, semînerê bi nasandina semînerdarku ji teref **Derwêş M. Ferho**, 'Mêhvanekî pîrr ezîz û qedirşînas heye. **Vî mirovê çê, ji bo gelê Kurd şerekî mezin daye, îro, ew dê li ser rewşa Kurdistanê û politîka dewleta Tirk bi axive. Kekê Mehdî zana hem politîkvan e, hem nivîskar e.**' dest pê kir. Ya balkêş ew bû ku guftûgo û pîrs û bersivan

bêhtir ji axaftina giştî dem girt. Tê wê manê ku xelkê Kurd li hinek bersiv û armancan digere, bendeyî rewşênbir û zanistê Kurd û ragihandina ye. Her çiqas, ne weke demên berê, gelê Kurd bê medya be jî, xelk, dive ku rastûrê agahdar û fêrî hinek tiştan bibe. Bi vê pêwanê, beşdaran hem fikrê xwe digotin û hem bersiva pîrsên xwe dixestin. **Mehdî Zana**, di destpêka axaftina xwe de bexişandina xwe ji hêla nivîskarî ve xwest û got: **'Ez, ne nivîskar im. Ji ber ku nivîskarî karekî pîrr bi nirx e... Ez di pirtûkên xwe de weke mirovekî çavdar, tiştên ku dibînim û têne serê min û welatliyên min, nexşe dikim.'** Axaftina **Zana**, ji xwe dest pê kir û dorferê domand. Gotina wî ya pêşî bû ew ku bi gotina devê wî mizgînî bû: **'Ez, mizgîniyekê bidime we ku Kurda dewlet daniye. Ji ber ku hemberê me di astengiyên wilo de ye ku Kurd bi serketine, ew binketine. Yanî, ê ku di nava tîrsê de dijîn êdî ne Kurd in, Tirk in. Gelê Kurd tîrsa xwe ji ser xwe avêtiye û li doza xwe û mafê xwe xwedî derdikeve.'** Rewşa Kurdistanê û gelê Kurd, di qonaxa politîk de, di qonaxa jiyana şer de wilo anî ziman. Lê, di jiyana rojane û deborê de, **Zana**, dilşikestî bû û di gotinên xwe de jî ne hewqasî degel û hêvîdar bû. Li gorî wî, hember komên xelkê, astengiya herî mezin ne şer e, ne mirin û girtin e, ne îşkence û perçiqandin e: **Birçîbûn e... Dîyar kir ku gel hember her hêrîş û derfetên dijwar bi hêrs û dilxwaz di rawestê, lê, hember birçîbûnê pîrr şepirze ye, stuxwar e. Zana got ku: 'Tîştê ne xweş ku min dît, birçîbûn e... Bê karûbarî ye.. Cot û cotbar nemaye... Celebvanî mirî ye... Xelk perîşan e... Bazara çarçî û kolanan xelas bû ye...'** Piştî vê ragihandinê armanca li pêşiya rêxistin û saziyên Kurdî, diyar kir û pêwistiya tifaqê, yanî yekbûnê şertê yekemîn e. Got ku: **'Rêxistinên dewletên dagirker teva, çi ofî bin, çi çep bin, çi rast bin, çi demokrat bin, di derheqê pîrsgirêka Kurdan de weke hev difikirin, weke hev di axivin. Dijîtiya navbera wan çi be, şikestikên di navbera wan de çiqasî mezin û kûr bin, di sedema Kurdan de yekin.'** Û hember vê dijwariya dagirkeran pêwistiya rêxistin û serdarên Kurdan anî ziman. Got ku. **'Gereke em Kurd hember vê dijwariyê xwe pêwistî hinek gavavêtin û şerûşurûtan bibînin. Heya îro Kurdan ji bêtifaqiyê winda kiriye. Dive ku em tifaqa xwe bikin yek. Lazimî û pêwistiya Kurdan bêhtir ji her demê, îro bi yekbûnê, bi tifaqê heye.'** Piştî van gotinan axaftin li ser demên berê rawestiya. **Mehdî Zana**, dema berê ku rêxistin danîn û tevger di nava rewşênbirên hingî de çêbû anî ziman û li ser astengên wê demê, çewtiyên wê demê rawestiya. Behsa damezrandina rêxistina

**Karkerên Sosyalist** kir û ew tîrsa mezin anî ziman. Têkiliyên navbera rewşênbirên Kurd û sosyalistên Tirk jî kire dabaş û dijwariya nezanîna demê û şûrûtên wan rojan bi taybetî, nedûrmeyzêna xwe û hevalên xwe ku di civînan û têkiliyan de derdikete pêşiya wan anî ziman. Got ku: **Dema ku me rêxistina sosyalist ava kir Tirseke pîrr mezin li ser me hebû. Em çend heb bûn.. Hejmara me li welat teva bi hejmara telîya bû...**

**Zana**, li ser rewşa îro rawestiya û xurtiya gelê Kurd û şikandina nîrê diljari û destpêka nîrê zêrîn kir. Behsa bedel û pêwistiya bidestxistina hinek tiştan kir. Ragihand ku ne li cem Kurdan bi tenê ev bedeldan heye, di şerê neteweyî de, di serhildan û têkoşinan de, li cihanê teva ev bedeldana giranbiha çê bûye. Got ku: **'Li cem me Kurdan zêdetir bedel hatiye dayin. Girantir û mezintir jî hatiye dayin. Lê dijminê tu gelî mîna dijminê Kurdan zalim û derfehafî nîne.'** Bi bîranîna demên berê û politîkayên şaş û çewt axaftina **Mehdî Zana**, berdewam kir û diyar kir ku Kurdan her dem bivir li çogên xwe da ne. **'Lê niha, Hedefeke Kurdan heye, xelasiya Kurdan. Ez bi dilrehetî dibêjim ku îro, şerekî giştî yê gelê Kurd heye.'** Herwiha axaftin hat û li ser karûbarê sazî û dezgehên Kurdî rawestiya. **Zana**, behsa dewleta Tirk û karûbarê wê di hêla propagandê û hember Kurdan de kir û mînakê ji gera xwe ya Amerîka Yekbûyî da û wiha got: **'Karê enstîtû û saziyan, gereke bibe ragihandin û daxuyaniya wêranî û perîşaniya gelê Kurd li Ewropa. Bi bûyerên ne mirovanî ku li Kurdistanê dibin û zilm û zordariya leşkerê Tirk, bi Ewropiyên bidin naskirin. Bi pirtûkan, bi rojnameyan, bi kartan, bi çend xêzikan bi faksan... Dewleta Tirk, ji bo propaganda hember şoreşa Kurdî, kesan dawetî Tirkiyê, ber Derya Spî dikin û di willayan de bi mehan seyranê didin kirin.'** Bilî van gotin û ragihandina axaftin hate ser şoreşê û bandura wê li ser gelê Kurd û guhertinê. **Mehdî Zana**, diyar kir ku **'Îro, gundiyeke ji Kurdistanê, 40 salî li pêşiya mirovekî Stembolî ye. Çima? Şer, em şiyar kirin e.'** Dawiya axaftinê semînerê bi rewşa guftûgoyê û pîrs û bersivan heya derengî şevê domand.

## REWŞENBÎR

*Destpêk rû. 1*

rojnamên rojane û bes bi zimanê Tirkî bête ziman. Kovar û rojnameyên çandî jî hewl bidin û li ser vî mijarî rawestin, bo nîgariya hewn û ramanan derbîkeve meydana, cihê xwe di nava guftûgoyê

de bi xurtî bigirin. Hêviya duyemîn jî ew e ku rewşênbirên Kur ! ne kevin kozik û metelîsan û hêrîşên tîr kîn û merem ne berdîn ser hevûdin. Di çarçewa zanistî (hewngîrî) de bimînin. Sêyemîn: Hêvî ewe ku rewşênbirên Kurd xwe, ne di

## DÎTINEK Û GAZINEK

### SÊRGO

Tevgera politîk ketiye qonaxêke bilind û asoyên me vekirine. Lê mixabin rewşênbir û bi taybetî muzîkvanên Kurd hîn li paş in û di kêferateke gundî de ne. Bêhtirîne wan, hevûdin kopî dikin. Yan jî hûnera biyaniyan dibin û bi kirasekî xeraptir li bin guhên me dixin. Bêhtirê van kesên ku li meydanê ne, darek û kodikek û derbekeyek xistine destên xwe de, ha ha dixine ding û ring.. Ez bawer dikim ku ev merhale wê derbas bibe. Bê çawa politîka Kurdî jî wê qonaxa teng û bê serûber derbas bû kete qonaxêke 'bi rêk û pêk, muzîka Kurdî jî, wê vê navberê derbasbibe. Muzîkvanên Kurd, ku bi rastî muzîkvanbin, wê li gorî pîvanên muzîk û huner derkevin meydanê. Gelek kesan (dengbêj) di bin kirasê stranên welatparêzî û bi gotinên beloq û gelekî sivik, ku ji devên wan mirî, bê mecal derdikevin, pîrr xerabî gihandin nirx û sembolan. Nîşanek ji gundîtî û paşvemaniya 'muzîkvanan' ewe ku taxima muzîka wan tembûr e û temê tembûrê ye. Ev jî, di destên wan de dengê kermekotî derdixe. Ez, mirovekî hunermendim û soz didim ku tu kesî hînî tembûrê nekim. Ji ber ku Şalûl û Bilbilan bar kirine, li şuna wan Bûm û Qijikan kon vedane. Mirado, M. Arif Cizrawî, Mihemed Şêxo çûn, kesî dewsa wan ne girt. Ez bixwe êdî ji saza xwe nefret dikim. Weke berê jî, hew dikarim li kasêtan guhdarî bikim. Ji ber ku min êdî her tişt bihiştiye û her kasetaya ku nû derdikeve bi Xwedayê şev û rojê, tu huner û awaza nû tê de nîne. Wehaye, ya elî keçel, ya keçel elî... **'Ay felek bo te dinalim bo çi nêrgîs çilmîşî...'**

kirasê rewşênbirên cihanê de bidin naskirin û xwe bi destên xwe nexin nava qalibên neradayî de. Di nava şert û şûrûtên civaka xwe de li bersivê bigerin û rêya gihiştina daxwaza gelê xwe û berpirsiyariya dîrokê bibînin.

## LI SER FOLKLOR Û MUZÎKA KURDÎ

Zozan OZMANÎ

Muzîk di hemû qonaxên jiyana netewan de rolek mezin di lîze. Kurdan jî, di vê mijarê de posîdeyên balkêş bi teybetî di rojhilata navîn de kirine. Bi awayê ku raman û kestên xwe herweha, gundî bi muzîk û awazan di pêçan û dianîn ziman. Şîn û şahiyên Kurdan çê ne bûne bê dîlok û sitran û awazên instrumental. Herwekî ji bo hêsakirina karûbarên xwe, bûyerên xwe yê dirêj û dijwar bi sitranan pêçan û ava kirin. Çilo, di şevên zivistanan de gel di odan de di civiyan, çîrok û peyvok û gotinên kevin, sitrankî di gotin, herwiha jî listîkên zarokan jî di çarçewa hunerî de cih digirtin. Lê hin bi hin, piştî teknîka nûjen derket, hola cîhanê (televîzyon, radyo, enstrumentên muzîka elektrônîkî...) bi xwe re jiyana mirovan jî guhert. Folklor û hûnerên gelerî di nav de... Ji hêla din ve, çiqasî jiyana Kurdistanê di warê aborî û civakî de bi rîtmek giran û qels pêş de diçe jî, car din pêşveçûnek tê hesabkirin û proseseke normal e. Herwiha jî ev qelsî bêye sedma pirr ûnîkal û enstrumentên hunera gel û jîbîrkirin û windakirinê... Weke tê zanîn, Kurd bi ol û diyalektên zimanê xwe di qonaxên guhertin û dîrokî de, ji hev cuda bûne. Folklor jî di vê wateyê de li gor herêman newekhevî de xwe diyar dike. Lewra, ji folklorê re berhevkin û lêkolînên giştî û teybetî divin.... Hinek ji wan berhevkin û lêkolînan, ji sala 1850 an dest pêkir. Ji hêla pisporan Elman, Ingilîz û Ermeniyar ve.... Lê ew hewldan bêhtir li ser folklorê devkî û şûnewarê wêjeyî bû. Herwekî, ji destpêka 1960 an de folklorê muzîkî, ji hêla *Nûra Cewarî* hate berhevkin, lêkolîn kirin. Di arşîva wê de dora 3000 nimûne hene. Yê ku ji Kurdên Ermenistanê, Gurcistanê û Kazakistanê hatine nivîsandin... Lê, dîse weke mîna ziman ku dive xebat û lêgerînek wisa li hemû

beş û navçeyên Kurdistanê bê kirin. Bo folklorê netewî bi renegekî giştî û gihiştî were ber çavan û cih di şopemayî ya gel de bistîne. Di nava kevneşopîya hunerên muzîkiya enstrumental û devkî de em dikarin bibînin ku Kurd çawa mijûl dibin û çilo jîyan û ruhiyeta xwe, bi renegekî hişmendiya gelerî diyar û serrast dike. Bilî vê jî, nîrxandin û lêkolîngerî di folklorê muzîkî de datîne berçavan. Bê Kurd bi çi awayî û metotan, awaz û melodyên xwe ava dikin. Wisa ji rîtm û formên sitranên xwe derdixine meydanê... Bi kurtî, folklor dikare ji nûve rapere. Dive afirandin di wateyê statîkî û felsefî û lêkolînan de rapere bibe. Folklor neyrik û canê gelan e. Îro, huner û çanda Kurdî li hemberî pîrsek pirr girîng rawestiya ye. Wek pîrsgirêkeke pêwîstî xwe dibîne û ji bo çareserkerîne, dive ku di nava çarçewa zanîstî de xebat bête kirin. Dive ku Kurd sazîyên muzîka profesyonel ava bikin li hemberî vê yekê, divê bê zanîn ku dîroka muzîka hemû gelan diyar dike ku muzîka profesyonel ji folklor tê der... Folklor hûm û zemîna bîngêhî e. Bilî ku nasnameya neteweyî ji awaz û nivîsaran re mercê yekem e. Û bi hevûdin ve girêdayî û hûnandî ye.

## VARLI

*Destpêk rû. 1*

lêkolîna gotin û gramerê çawa pêk anîye, anî ziman... Weha got: **'Di destpêka wergerê de, ji qelsiya ferhenga gotinên Kurdî di mêjiyê min de, têra wergera Quranê nekîr... Min hewl da xwe û gera li gotinan di nava civata Kurdî de... Li dengbêj û kalejin û kalêmêran geriyam. Hingî min dît ku zimanê Kurdî ji zimanê demedorên xwe dewlementir e, di nava zimanê cîhanê de jî, zimanekî dewlemend û bi nîrx e. Mixabin ne bi xwedî ye û nehatiye parastin. Hêviyên me ji îro pê de hene ku zimanê Kurdî wê nîrxê xwe bibîne.'** Varli, diyar kir ku, di dema werger û lêkolîna tefsîrê de, liqasî dîroka Kurdî bû ye. Pirr wesaîk û dabaşên bi nîrx jî dîtine, bo xebata pêşerojan, berdest kirine. Bilî vê, dema ku wergera Quranê xelas kiriye, got ku: **'Min werger ji pirr kesên zana ê Kurd re şand û fikrê wan pîrsî. Heya bi Kurdên Afganistan re tîkiliyên min çêbûn.'** Piştî axaftinê guftûgoya pîrs û bersivan dest pê kir. Lê di vê nîqaşê de dabaş hat û li dora dîrokê rawestiya. Dîroka Kurda bi pîralî hate ziman û bi ferehî axaftin li ser çê bûn. Birêz Varli, di bersivên xwe de pîr fereh û nav û cih û reqem anîne ziman. Ji pîrtûkên olî, Zend Aveste bigrin, Tewrat, Mishefa Reş, Qewlê Sor, Quran, Êncîl û heyra bi olên Hindî mînak anîn û bi zimanekî nerm, zanîstî axaftina xwe domand.

## AMADEBÛNA NAVENDA LÊKOLÎNÊN KURDÎ LI MOSKOWAYÊ Û WEŞANÊN WÊ

Wezîrê EŞO

Rusya, bi heqî hesab dibe welatê Kurdzaniyê, çawa şaxekî rojhilatzaniyê, yê cuda û serbixwe... Hela, hê sedsala 19 an, pîrr zane, rêwî, dîplomata û ajansên dewleta Rusyayê li Kurdistanê qesidîne. Bi nêt û meremê zaniyariyê û politîka nasiya xwe dane ziman, kultur û dîroka gelê Kurd û xebatên hêja ser Kurda, jiyana êl û eşîrên wan, dîrok, literatura bi nivîsar û zar, etnografya wan nivîsîn û beşeke wan weşandine... Hinek ji wana bûne rimza Kurdzaniyê û navên wan ketine rûpelên dîroka Kurdzaniyê. X. Aboviyan, P. Averiyarov, V. Dittel, Karzov, P. Lêrx, V. Mînorîkî û ên din. Lê konsulê Rusyayê li Erziromê nivê sedsala 19 an, A. Jaba bi destê zanayê Kurd, yê bi navûdeng Melle Mehmûdê Bazîdî, pîrr destxetên Kurdî civandin û bi xwe re anîne payitexta Rusyayê êwê dewrê, Petersburgê... Nava salên dawî de ew destxet bi destên Kurdzanên pispor bi zimanê Rusî hatin wergerandin û bi faksîmîle (bingeha wan ya eslî) hatin weşandin. Sedsala 20 an, Kurdzanî li Rusyayê, di dema xesma Sovyetistanê de, bêhtir pêş de çû. Bingeha Kurdzaniyê li Rusyayê şagirtê N. Mar Hovsêb Orbelî, eslê xwe de Ermenî, li Petersburgê danî. Di wê sedsaliyê de wergehuzeziya kifşê kete nava Kurdzaniya Yekîtiya Sovyetistanê bi wê fikrê, ku Kurdzan ji nava Kurdan peyda bûn û ewladên gelê Kurd dest bi lêkolînên Kurdzaniyê kirin. Heciyê Cindî, Qenatê Kurdo, Emînê Evdal, Çerkezê Bakaoyev, Şekiroyê Miho, Îvan Farizov, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Zera Usiv, Şerefê Eşîr, Meksîmê Xemo, Karlênê Çeçanî, Xalî Çetoîyev, Memoîyê Xalî û yê din. Van Kurdzan û yê biyanî di nava van 3 navendê Kurdzaniyê de karê xwe pêkanîn. Li Petersburgê, Yerîvanê û Moskowayê... Lê mixabin piştî jihevberdana Yekîtiya Sovyetistanê hinek kêmasî ketin nava Kurdzaniyê de. Bona hilanîna vê kêmaniyê bi inisiyatîfa Kurdzanê bi navûdeng profesor Şekiroyê Miho li Moskowayê, navenda lêkolînên Kurdzaniyê salên dawî hate amadekirin. Bi navê 'Navenda Kurdî ya Zaniyariyê û Ronekdariyê'. Ewê merem daniye nava zemanê nêzik de çend pîrtûkên giranbiha li ser ziman, dîrok û kultura Kurda binivîse û bide weşandinê. 'Antolojiya Kurdî', Dîroka Gelê Kurd, (ji zemanê herî kevnar heyra rojên me.), Kurdistanê Îranê Salên 60/70 î yê sedsala 20 an.' Pîrtûkên ola Kurdên Êzdahî... 'Pîrtûka Jalva, Mishefa Reş... Tiştêkî şahî ye û pîroz e... Ku vê navendê pîrtûkek, ya pêşin li Moskowayê weşand bi navê 'Kurdistanê Zemanê Niha'. Derheqa naveroka vê berevokê û hinek tiştên din jî, bi dorferehî, bi dîrok û hinek bîranîn, em dê di meqaleya xwe ya piştê gili bikin...

## CEND PÎRSÊN HÊSA

**Kerim M. BAQÛSTANÎ**

Di t kiliy n navbera  and   pol tik de, k jan ji wan bi ser dikeve? K jan  ya din ji xwe deraniye? Gelo, projeyek w jey  di hinav n her karek  huner  de heye? Ango kar n me y n w jey  h ja   s le (st lih) ne ku projey n huner  li ser wan avabibin? Herwiha j , gelo day n   berhem n kevin   n  bi gewde bibe, an real te dive bilind bibe, heya bigihe qonaxa w jey ?

Ji h la din ve w je li ser  i encam  nasnameya xwe ya netewey  p k t ne? Netewe xwe disp re  i di w je de? K jan ji palgey n serek  di w je de derf   ke tivan n netewey  xuya   diyar dike?  i ji wan palgeyan cih  yekem n qezenc dike? Naverok bi ajan n xwe y n gi t  an alav n avahiy ?

Herwek  em xwe heya k jan qonax  berpirsiyar dib nin di v  mijara afir na w je    and  de? Berpirsiyariyek wisa barek  du al  t ne ber destan, yek j  b jinkkirina   newar   klasik, ji n  ve, ji xwe ya din ewe ku em li wata n jeniy  vegezin,  ye    i dive. Ji ber ku: ‘Kevnar bi ber k ferat  de  i   n jen  j  h na nikare ji dayik bibe. Di v  navber  de gelek berge   desp k n ne tendur st  y n renga renga derd cin.’ (A. Gramsi)

Mebesta min ‘helbet’ ne ki a ser ti teki ye, l  li ti teki na nih rim di p van n xweday  de. Ji ber ku ez bawerim ku ‘w je liv na can  ku bi pos dey n r met , sinc    d hn  mijara real te di niv s  de d guher ne.’ (Selim Berekat). Herwek  ku T. Elyot t  hejmartin weke bav  n jeniya w je Ewrop  (tuxm  helbest ), diyare ku di helbesta xwe de (gerd na xap re) ya (b goman) kil ta helbesta n jen b , pirr xwespartin    avkaniy n w  ji   newar b n, bi teybet  ji   newar  ol  b n. Normal e, heger em j  weke her millet n c han  pi giriya   nemay    kevnar n xwe bikin, l  heger

em awarte man,  di dive pi giriya me j , awarte be di rexne   nirxandin n hem  b yer   valahiya d roka me de: em ne al giriy n r meta metafizik  ne. Ji bil  ku karekerek  wisa heb , herwek  ku tune be, belk  em d  tune ba ne. Ev yek bi xwe serkeftin n d rok  y n Ewropa t ne b ra mirov. Ew serkeftin n ku pi t  b yer  M. Loter y  di destp ka n viy  duem n de, ji S. S. 16 an. Ji mer ja S.S hi mendiy  b n di  ar ewa s  dayik n  ore i de y n **Dekart, Sp noze   Libinz** y n ji aliy n xwe de Ewropa dehdan, bi ber n jeniya raman    hejin   peqin n pol tik  de...

Mebest ewe ku  ore a zanist  xwe disp re ser azadkirina hi mendiya felsef  bo berevkirina encam n d tir, li gor s ni ik  n jeniy ...

### Ekonom /Pol tik /Cand   felsef 

Li gor v  yek  d san , civata Kurd  teybetmendiya xwe dist ne, li gor ku ‘ iqas asteng n civak  dijiwartir n dibin, w jeya xwe ik   bedew dirapere’. Naxwe, heger ev ya daw  di heb n  de tune be, hi   afirn  j  rola xwe pa ve  i   pa eroj  de di  re, ‘ di di be b rek radest   hi  hi mendiyek wisa, ew d   i pergal   rew   bist ne di  ah  ya  ore a zanistiya n jen  de. Ew  ah  ya zanist  di alik  xwe de tekn k   teknolojiya ku ne ji mer ja ya p  in be ew d  bikaribe ya duyem n p k b ne?’

B goman, pirr sedem   encam li hev t n h nandin di bersivdana v  yek  de. L  ya gir ngtir n ewe ku ziman  netewey  di guhertin n  ore i y n w jey  de. Yek ji alav n, tu caran, pa guh nabe... Herweha j , merc n p wistir n li ba w jevan n Kurd pa guh na be. Na xwe ev lehiya dewlemend   afir na bi ber bi al  me de t  ku weke as manek  fereh xwe li pir n me bip  e   me di xwe de  a o/ma c bike, an tune bike li gor  r dara xwerist  ku ‘k  ji dayik b , ku bi  arlep  bi . Tu caran na fire...  iqas hewl bike...’

Mebest ewe ku em w jeya n jen li ser bingehek  t gihi t    hemdem  avabikin.

##  ALAKIY N ENSTITUY  BERDEWAM DIKIN

Pi t  kongreya salane   biryara hat  standin,  alakiy n Enstituy  di her h li de b  rawestandin berdeyam dikin. Bi ders n Kurd  ji teref **Perv n Cem l**, di destp ka meha **Adar ** de bi dorferh    pirmijar, sem neran dest p  die. Di van sem neran de, w je, abor , d rok, pol tik,  apemen , saz    dezgeh n netewey    komputer, di teknolojiya komputeran   klawiye bi pit n (pitik n) Kurd  cih digirin. Li ser komputer   klawiya Kurd , **Bulent Yal in**, li ser problema Kurdan li Tirkiy , rojnamevan **Ronny Vos**, li ser Kurd n

Sovyet  **Wez r  E o**, li ser rola medya **Ey b Bur **, her weke din **Koen Van Bael**, **Shirin Kaplan**, **Meden  Ferho**, **Goele Kuijpers** w  sem neran bidin. Pi t  t kil    ragihandina  alakiy n sal , rew  nbr n Kurd j  hewl dane ser xebat   kar bar  Enstituy    soza pi tgiriy  dan. Ev kes n     h ja, **Prof. Celil  Celil**, **Dr. Naci Kutlay**, **niv skar Ferat Cewer **, **niv skar Huseyin Kartal**, **zimanzan Zerde t Haco**, **Avukat Serhat Bucak**, **Avukat  erafett n Kaya   civakzan İlhan Kizilhan** hene.

B goman, ev t kil  h viyek mezin dide ku di h la xebatek zanist    l kolin n akademik de firazeyek pirr ba    hemdem  derbikeve meydan .

## dax yan 

Ser  3 mehan carek , bi **agahdari** re, em d  bi rojnameyek 4 r pel  li se ** apemeniya Kurd ** rawestin. Rawestandina li ser  apemeniya Kurd  w  pirral  be. Ji m zanpaj  heya bi naverok   rexnegiriya naverokan, ziman, tekn k    emala encama raman. B goman, di v  war  de valayiyek

heye. Kes j  bi tevay    tebay  bi ser v  mijar  de na  . Rexnegir  j  dinav de... B  rexnegir , w je    and p  de na e   li ser bingehek  sexlem   r k   p k na r ne... Weke pirr h l n din j , kes n xwe niv skar   rew  nbr  dib nin, bi teybet  giraniya xwe di h la pol tik de n  an didin. Ev sedem j  dibe valahiyekek pirr mezin   gir ng...

## agahdari

we ana  
Enstituya Kurd   
ya Bruksel 

berpirsiyar : Medeni FERHO  
redaksiyon: Kerim Baq stan   
Wez r  E o - Ejder Mehemed

Navn  an:  
Bonnelstraat 16, 1040 BRUKSEL  
Tel: 02/230 89 30, Fax: 02/230 34 02

Niv skar berpirsiyar n  
niv s n xwe ne